

Dumahîk : Te got û

ku , pir qels e . Belkî pirî caran jî kartêkirinek neyînî jî dilîze . Ew jî di çarçawa rexin , lome û gotgotên ne pîvayî de dere û tê .

Wêlomê jî tevgera Kurd li Sûriyê jar , perçe , nelihev û dûrî cemawerê Kurd de Vêca gelî partiyên bura heval , dost , û xemxarên doza Kurd li Sûriyê , ez di bextê we da me zor bilezînin û li doz û tevgera xwe xwedî derkevin . Ji ber ku , karwan bi lez bi rê ketî û diçe , tirsî mine em li şûn bimîn .

Dumahîk: Sûriyê û....

rijîma parta Be'is dihêlin ku jiyana û têkliyên xelkê , xwe bi xwe , aloz û tevlihev bibin , girêk û nakokî bêtir û gurtir bibin , bi taybetî encam û kartêkirina rola fermîna 49 ya 30-09-2008 an , ya ku hêştîye pêvajoya jiyana aborî , kirînfirotan û pirojeyên avahiyê di herêmên Cezîr , kurdax , Kobaniyê û Tilebyedê de bi tundî bêne dorpêçkirin , rê li ber teng bibe û bête girtin . Lewre jî , li gor vê tabloya jiyana rojane ya hundirê Sûriyê bi kurd û Ereben xwe ve , û berdewamiya siyaseta tek partiyê , rojên nêzîk ne yên xêr û xweşiyê ne. Loma jî , barê rewşenbîr , zana û hişmendî , barê partiyên û siyasethanên dilsoz her diçe nazik û girantir dibe . Hest û bawerî bi rê û şeweyên hevkarî û lihevkerî di navbera kesên de , di navbera civakê de , bingeha hêja ya herî sereke ye .

Sînorê yekta

Dumahîk : Hevpeyvîn.....

P12-Derveyî siyasethê , weşana NEWROZ guhdariyê li zimanê kurdî dike, gelo hun

Wek sazî we çî kar ji bo zimanê kurdî kiriye?.

B12- Bi rastî, me tu karê wilo berçav ji bo zimanê kurdî nekiriye, lê hevalin me Hene, ew di girûpên zimên de kar dikin, lê bi rastî ev nîfşê me yê nû guhdariyê li ziman û çanda gelê xwe dike, ez dibînim gereke partiyên me piştgîriya van girûpan bikin. Hêjayî gotinê ye, di warê

zimanê kurdî de ez dibînim gerek a-vekirina dibistanên fêrkirina zimanê kurdî, li herêmên ku kurd lê dijîn pêwîst e.

b- Gereke zimanê kurdî li Sûriyê bibe zimanê fermî yê diwemîn, ji ber jimara gelê me 15%ji niştimanwerên Sûriyê ye.


c-Gerek ev girûpên ziman di bin çavdêriya partiyên tevgerê de bin û ew jî ji wan re piştgir bin .

P13-Gotina te ya dawî ji xwendevanên NEWROZê re çiyê mamoste?.

B13- -silav û rêzên min ji xwendevanên NEWROZ re hene, bi rastî, ew di çanda kurdî de mûmeke balkêş e, ez daxwaza ferehkirina babetên wê dikim, rêz û hurmeta min ji NEWROZ re heye. Gotina min ya dawî ji herkesî re ye (Gereke em rêz û hurmeta mirovan bigrin, ji ber ku ew mirov in).

Mehmûdê Helaq(Bavê Siwar)

Çû ber dilovaniya Xwedê



Roja Sêşembê
14.10.2008 Z,
xelkên taxa
Kornîş li
Qamişlo û
malbata **Xelef
Biro**, xatirên
xwe yê dawî ji

welatparêzê bi rûmet **Mehmûdê Helaq** xwestin û laşê wî di goristana gundê **Sêmitik** de bi cih kirin.

Sala 1933an, Mehmûdê çavên xwe li ronahiya gerdûnê vedike û di malbateke welathez de mezin û perwer dibe. Piştî ku ew bîrewer dibe, di tevgera kurdî de cih digre û xebata rêxistinî dike û ji bo doza gelê xwe ya dadmend ji dil û can kar û xebatê dike, ji hevalên xwe re dibe nimûneyeke balkêş. Serê malbat, dost, heval û hogirên wî sax be û xwedê wî bi buhuştî xwe şa bike